



Ji zimanê 'bav û kalan'...

Peyva 'zimanê dayikê' di gelek zimanan de peyveke rûniştî ye. Gelek civak zimanê ku di biçûkahiye de tê fêrkirin, wek zimanê dayikê bi nav dikin. Lê pênasê û naveroka wê peyvê li gorî hişmendî û çanda civakan her wiha li gorî şert û mercên heytî diguhere... *Munewer Azizoglu Bazan / R.2*



Geşkirina çand û zimanî

Divê plan, plansazî û bernameya ziman û çandê ya kurdan hebe. Ji bo ku rewşa zimanî û helwesta gel diyar bibin, divê xebatên rapirsînê werin kirin. Di qada ziman û perwerdeyê da bila navenda amadekirina materyalan were avakirin û xebatên domdar werin kirin... *Samî Tan / R.5*



Diranê Zelêxanê

Kal û pîran gotin ku di nav me da tenê taximê diranê Zelêxanê heye, ew jî dema bi me hêrs bibe diranê xwe nade me, lê gava ku dilê wê xweş be taximê diranê xwe dide me, em dor bi dor bi wan diranê Zelêxanê xwarina xwe bi lez û bez dicûn... *Kewê Redkan / R.10*

Rojnameya Heftane

www.xwebun.org

xwebûn

27 Çile - 2 Sibat 2020

Hejmar: 6

Buha: 4 TL

rojname@xwebun.org


Di sînemayê de jinek; Blache

Dema mirov li destpêka mirovahiye dinihêre dibîne ku yên civakê avakiriye û pêşengî jî civakê re kiriye jin in. Dîroka sînemayê dîrokeke kevn nîn e lê belê tu dinihêrî yan navê jinê tune ye yan jî wekî ne bihêz û kêmaqil e, hatiye dîtîn. Lê belê rastî ne wisa ye, dîrok jî hêla serdestan ve hatiye nivîsîn. Dema tu dîroka sînemayê dikolî jin hene û karên gelek hêja jî kirine. Yek jî van jinan jî Alice Guy Blache ye... *Ceylan Akbaşlı / R.3*

Xeleka şewekariya kurdî nehatiye duristkirin

Şewekar û rojnamevanê kurd Lukman Ehmed ku salên dirêj xwe daye ser şewekariyê û di vî warî de bûye xwedî berhemên bedew, bi xêzên xwe tu caran xwe durrî rojêva kurdan nekiriye. Ew her dem bi tablo û xêzên xwe li welat û derveyî welat bûye mêvanê bi dehan pêşangehan. Şewekar Ehmed ev tişt anî

ziman: "Ez her dem dibêjim ku hunermend wek filter e, alav û keresteyên xav û xwezayî jî civakê distîne û di raman û xeyalên xwe de wan jî nû ve daifirîne û careke din bi şewazeke din vedigerîne civakê. Netewe, çand e, huner e û ziman e, ji ber ku ev dibin gewdeyê neteweyê..." *Hevpeyvîna Rizoyê Xerzî - R.4*



Derî ji bo yekitiyê vedibin



Bi salan e nîqaşên li ser yekitiya neteweyî didomin. Herî dawî li Amedê partiyên kurd ji bo yekitiya neteweyî komxebat li dar xist. Bi rastî heta niha jî, ji bo yekitiyê ji bilî bangewaziyan tiştê nehatiye kirin. Ji ber berjewendiyên ev barê giran li erdê ma. Cara yekem e ku partiyên kurd ji dil û can hatin cem hev û hewl didin vî barê giran hilgirin... *RÛPEL - 7*

Leşkerên peretî yên Rûsyayê

Li Rûsyayê bi navê Vagner şirketeke leşkerî û peretî heye lê li Rûsyayê bi awayekî fermî hebûna wê şirkete nayê qebûl kirin. Di rojnameyên nêzî hikûmeta Rûsyayê de behsa wê şirkete nayê kirin, lê haya cihanê jî wê şirkete heye û endamên wan li Ukrayna û Sûriyeyê dimirin. Ev şirket ewil li bajarê Donbaskê yê Ukraynayê derket holê û piştê berê xwe da Sûriyeyê. Niha jî li Lîbyayê behsa hebûna wan tê kirin... *Aysel Tabak / R.6*

Muzîka Sîya Şevê

Têkilîya dagirker û dagirbûyî, kolonyalist û kolonîbûyî, serdest û bindest, stemkar û stembar, jin û mêr her çiqas di nav xwe de û ji diyalektîka efendî û kole cîyawazî û taybetiyên wan hene jî, di kokê de digihêjin diyalektîka efendî û kole. Ji ber wê yekê, em dikarin van têkilîyan bi diyalektîka efendî û koleyê bixwînin û binirxînin. Di diyalektîka efendî û kole de azadkeriya muzîka Sîya Şevê... *Welat Ramînazad / RÛPEL - 11*



Gundê Şatiroxlî

Gundê Şatiroxliyê jî Qersê 30, ji Dîgorê 20 kîlometreyan durr e. Li alî rojava, gund pala xwe daye girê Şatiroxliyê. Rasta pêşiya wê; çayira axê û kirê keraliyê ye, ev rast heya sinorê gundên Bazarcix, Gulheyran û Eylasincî fireh dibe... *Ayhan Erkmen / RÛPEL - 8*

Ji gundewariyê ber bi bajarvaniyê ve êşa zimên

Zimanê kurdî zimanekî gelek kevnar e. Rehên zimanê kurdî xwe digihînin pênc hezar sal berê. Taybetiyeke zimanê kurdî heye ku gundewariyê mohra xwe lê xistiye. Ziman di bêjînga pêdiviyên wê jîyanê re derbas dibe, dikare têra danûstandinan bike. Ji ber wê rastiye ziman xwe dispêre ragihandina hêsan. Ziman çiqas hêsan be tîgihîştin jî ew qas hêsan dibe... *Yaşar Eroglu / RÛPEL - 5*

M. Alî Ertaş
Çaw kor,
ziman lal
Rûpel - 3

Cemîl Oguz
Riha de çirê pîrekî û
mêrdey fek jobînî...
Rûpel - 9

Asya Xerzan
Dilê min bi Şengalî
lê dixê îro!
Rûpel - 12

Di sînemayê de derhênera jin a yekem

Ceylan Akbaşlı

Dema mirov li destpêka mirovahiye dinihêre dibîne ku yên civakê avakiriyê û pêşengî ji civakê re kiriyê jin in. Jin her tim bûne rêvebir û xwedawenda civakê. Lê çî qewimî ku jin bû cînsa duyemîn. Jin bijîşk û hurnemenda yekemîn bû, çawa bû cînsa duyemîn.

Jin zanist bû lê di yûnana antîk de çawa bû mêrê nîvco. Vê pîrsê em ji xwe dikin; çawa bû ku ji her hêlê ve di nav civakê de rola me hat dizîn. Ji hêla zanistî, felsefî, olî û hunerê ve... Dema tu li hunerê dinihêrî yan jin tune ne yan jî di wêne, wêje, şano û sînemayê de wek meta hatine bikaranîn.

Dîroka sînemayê dîrokeke kevn nîn e lê belê tu dinihêrî yan navê jinê tune ye yan jî wekî ne bihêz û kêmaqil e hatine dîtin. Lê belê rastî ne wisa ye, dîrok ji hêla serdestan ve hatiye nivîsîn. Dema tu dîroka sînemayê dikolî jin hene û karên gelek hêja ji kirine. Yek ji van jinan jî Alice Guy Blache ye.

Çîrokan tev li sînemayê kir
Alice Guy Blache di sala

1873'yan de li Fransayê ji dayik bûye. Di sînemayê de derhênera jin a yekem e. Yek ji wan kesan e ku çîrokan saz kiriyê û tev li sînemayê kiriyê. Di destpêkê de di sînemayê de tenê girteyên yekdeqeyî hebûn, çîrok tunebûn. Hin bi hin çîrok li sînemayê zêde bû.

Dîrokanên sînemayê yên sînematoğrafîyê îcad dikin, filman çêdikin û nişan didin, sînemayê bi Auguste û Louise Lumière didin destpêkirin. Dûre navên wek George Méliès, Edwin S. Porter, Griffith û hwd. li wan navan zêde dibin. Bêguman ev kes tev mêr in! Lê gava mirov bala xwe baş dide dîroka sînemayê mirov dibîne ku piştî Lumièrean kesekê bi navê Blache heye û li gor dema xwe filmên

pak çêkirine, lê mixabin em navê wê zêde nabihîzin û ew nav qet nayê bibîranîn. Filmên Lumière çiqas baş bin jî filmên Blacheyê du qat ji filmên wan baştir in. Sînemaya ji sala 1895'an tê destpêkirin û Blache jî di sala 1896'an de dest bi çêkirina filman kiriyê. Wekî tê zanîn wê demê hêj mafê dengdayîna jinan tunebû û jin bi hêsanî nikarin hin karan bikin. Lê Alice Guy Blache xwe li derhêneriyê girêdabû û li gor dema xwe filmên hêja derxistbû holê.

Alice Guy Blache di sala 1873'yan de li Fransayê ji dayik bûye. Di sînemayê de yekem derhênera jin e. Yek ji wan kesan e ku çîrokan saz kiriyê û tev li sînemayê kiriyê

bûn hin karan bikin. Lê Alice Guy Blache xwe li derhêneriyê girêdabû û li gor dema xwe filmên hêja derxistbû holê.

Stûdyoya filmê ava dike
Blache ku demek li Fransayê dimîne, piştê derbasî Amerîkayê dibe û li wir bi cih dibe. Blache wê demê stûdyoyek bi navê 'Salox Stûdios' ava dike û karê prodûktoriyê jî hildigire ser milê xwe. Blache li wê stûdyoyê

gelek film çêkirine û mirov wan filman di roja me de jî dikare temaşe bike. Li gor destpêka sînemayê û hişmendiya ku jin di mal de heps dikir û nedixwest ew tu afrînerî derbixê holê, Blacheyê karên gelek baş û serkeftî kirine. Lê tevî ewqas serkeftinên Blacheyê, di karê sînema û hunerê de jî navê wê nedihat gotin.

Bi hunera xwe dijî
Lê belê her çiqas kesên dîroka hunera sînemayê dinivîsin ew bi bîr nedianîn û ew didin jî-bîrkirin jî Blache bi jîyan, huner û filmên xwe hê jî dijî. Em wekî jin jî dîroka ku ji aliyê serdestan ve hatiye nivîsîn red dikin û dibêjin ku em ê bi xwe dîroka xwe bikolin û heqî-qetê derxin holê...

Navên çend filmên Blacheyê:
Filma La Fee Aux Choux di 1896'an de, filma Anarchite di 1906'an de, filma Femîniizmê di 1906'an de, filma Dance Serpentine di 1900'i de û filma Falling Leaves di 1912'yan de hatiye kişandin.

Biyan



Munewer Azizoglu Bazan

Ji zimanê 'bavûkalan' ber bi yê 'dayikan' ve

Peyva 'zimanê dayikê' di gelek zimanan de peyveke rûniştî ye. Gelek civak û netewe zimanê di biçûkahiye de tê fêrkirin, wek zimanê dayikê bi nav dikin. Lê pênase û naveroka wê peyvê li gorî hişmendî û çanda civakan her wiha li gorî şert û mercên heylî diguhere. Her çiqas di hêla zimannasiyê de zimanê dayikê beylî ku rola 'dayikê' bê diyarkirin, wek 'zimanê ku di destpêkê tê fêrbûn, zimanê ku mirov xwe baştir pê ifade dike yan jî wek zimanê yekemîn' bê pênasekirin jî, gelek zimanzan di wê peyvê de balê dikişînin ser rola dayikê. Ango zarok berî were dinyayê dengê diya xwe nas dike, bi deng û zimanê dayika xwe mezin dibe. Têkiliya yekemîn bi dayikê re ye. Lewre zimanê yekemîn, wek zimanê dayikê tê binavkirin. Ev pênase béguman ji hêla hin jinan û femînistan ve jî bi şanazî tê silavkirin. Wek gelek nîrxên civakî ziman jî bi dayik, angî bi jinê ve tê girêdan. Heta di nîqaşên me yên navxweyî de jî her tim mirov/jin di pêşketin û paşketina zimên de balê dikişînin ser rola dayikê kurd. Ango tê gotin ku zimanê kurdî heta niha bi saya dayikê kurd xwe parastîye, aniye roja me û jî niha şûn ve jî divê dayik bi zimanê kurdî bi zarokên xwe re bipeyivin da ku ziman dikaribe xwe bigihîne nîfşên nû. Ger dayik wê yekê nekin, dê ziman winda bibe û ew ê berrîsiyarên helandinê jî destpêkê dayik bin.

Lê ev tesbît li beramberî niyet û xwesteka xwe ya paqij hinek pîrsgirêkan di nav xwe de dihevine: Bêguman di parastina zimanê kurdî de roleke pêwîst a dayikan heye. Lê dema mirov wê tesbîtê bi aliyên din ên civakê re negire dest dê gelek kêmasî derkevin holê. Dayikî ligel taybetiya xwe ya biyolojîk kategoriyeke civakî, polîtîk û çandî ye. Li gorî taybetiyên civakan, li gorî demê naverok û wateya wê diguhere. Ya ku îro di wê mijarê de tê destgirtin, angî dayika ku di nav malê de beramberî karûbarên malê berrîsiyariya xwedikirin û perwerdeya zarokan digire ser milê xwe, îcadê sedesala 20'emin e. Dayikatiya malbata teng, qada taybet û girtî, endama saziya herî bingehîn a bavkalsariyê ye. Lê em dizanin ku dayikî û xwedikirina zarokan heta destpêka sedesala modernîteyê peywişên civakî bûn, ne takekesî (îndivîduel) kolektîf bûn. Zarok ne tenê di bin berrîsiyariya dayikan de bûn, bav û civak jî di perwerdekirina zarokan de roleke wan a girîng hebû. Zarok ligel zimanê xwe, çand, nîrx û kevneşopiyên civaka xwe jî kesên derdora xwe bi rêya dan û standin, çavdêrî û şopandinê fêr dibûn. Mal ne qada taybet bû. Zarok û dayik di heman demê de endamên qada cemaweriyê bûn.

Lewma jî mirov dikare bibêje ku ya zimanê kurdî (an jî bi giştî zimanên ne xwedî saziyên navendî) gihandiye roja me, ligel gelek sedemên din civakîbûna komunal e; ne dayikîya modern e ku îro em jî bo wê yekê spasiya wê dikin û jî bo têkçûna zimên jî wê tawanbar dikin. Ya ku zimên tune dike têkçûna civaka komunal e.

Zana Farqînî di nivîseke xwe de (2006) balê dikişîne ser bikaranîna modern ên cuda wek 'zimanê zîkmakî, zimanê maderî, zimanê dayikê' û hwd. Li gorî Farqînî di zimanê kurdî de gotina 'zimanê bav û kalan' tê bikaranîn; lê ger mirov bixwaze dikare awayê wê yê modern angî 'zimanê dayikê' jî bi kar bîne. Peyva 'bav û kalan' mijareke rexneyê ye, lê bila niha bimîne. Lê jî 'zimanê dayikê' zêdetir a rastiya zimanê kurdî dide der, bi rastî jî peyva 'zimanê bav û kalan' e.

Ji ber krîza civakî dawî li jiyana xwe tînin

Navenda Nûçeyan

Li başûrê Kurdistanê hefteya borî herî kêm du jin bedena xwe dan ber agir û jiyana xwe ji dest da. Piştî van her du bûyeran mijara xweşewitandina jinan ket rojevê.

Li gelemperiya Başûr hema bêje ji sedî 95'ê jinan bi rêya şewatê dawî li jiyana xwe tînin. Li gorî îstatîstîkan salê bi sedan jin bi vî awayî xwe dikujin.

Li başûrê Kurdistanê ku para xwe ji geşadanên li Rojhilata Navîn digire, ligel krîzên siyasî û aborî, krîzeke civakî jî heye. Wekî her carê di nav van krîzan de herî zêde jin tînin ecîqandin. Jinên ku di nav civakê de ne xwedî maf in, her tim wek sedema pîrsgirêkan tînin dîtin û zext li wan tînin kirin. Ji ber wê yekê jinên başûrî yên ku di civakê de tînin ecîqandin, bi xweşewitandinê peyamê didin civakê.

Li gorî hin derûnnasan

(psîkolog) jin bi vî awayî êş û zextên civakê yên li ser xwe, bi xweşewitandinê nişanî civakê didin. Lê tevî wê yekê jî bûyerên bi vî rengî ji raya giştî tînin veşartin. Li aliyê din desthilata heylî li cihê ku çareser bike, bi polîtîkayên xwe yên şaş bêhtir dibe sedem ku bûyerên bi vî rengî zêde bibin.

Saziyên jin zêde ne çalak in

Lê tiştê herî berbiçav ew e ku li hemberî bûyerên bi vî rengî saziyên jinan ên Başûr jî ewqas ne çalak in. Jixwe parlamenterên jin di bin bandora polîtîkayên partiyên xwe de ne û jî ber wê yekê pir zêde naçin ser bûyerên wiha. Ev helwesta saziyên jinan û parlamenterên jin dibe sedem ku jin bê hêvî bibin û serî li rêbazên bi vî rengî bidin.

Bi taybetî jinên başûrî herî zêde ji neçalakbûna saziyên jinan bi gazinc in. Jin diyar dikin ku saziyên jinan zêde bi pîrsgirêkên jinên herêmê re eleqedar nabin. Ji bilî çend sa-

ziyên jinan, kes li pey kuştina jinan nakeve. Ji ber wê yekê jî li herêmê hejmarê jinên ku xwe dikujin bi zelalî ne diyar in. Çimkî ne mekanîzmaya jinan van bûyeran bişopîne heye û ne jî hikûmet jî aliyê zagonan ve tu çareseriyek pêk tîne. Ev her du sedemên bingehîn dibin sedem ku jin dawî li jiyana xwe bînin.

Ji ber wê yekê li başûrê Kurdistanê, divê demildest jî bo ku jin dawî li jiyana xwe neyînin, saziyên jinan hîn çalaktir erka xwe bi cih bînin. Jin encax bi awayekî birêxistin-kirî û bi avakirina têkiliyên xurt ên di navbera xwe de dikarin rê li bûyerên xwekuştina jinan bigirin.



Notirvanî li ser şopa cerdevaniyê ye

Ji bo ku pergala noteraniyê jî weke ya cerdevaniyê mayînde bibe, AKP rayeyên wê zêde kirin. Lê ji ber pêkanînen wan, civak weke cerdevaniyê jî aciz e

Qedri Esen

Pergala Notirvaniyê, piştî Hewlêdana Darbeya Leşkerî ya 15'ê Tirmehê, li Tirkîyeyê ket meriyetê. Li gel ku pêwîstiyêke bi vî rengî tune ye jî ev pergala niha di meriyetê de ye û di bin banê wê de bi hezaran kes hatin çekdarkirin. Li gel destpêkê hat gotin ku noteran dê li taxan bixebitin û agahiyên îstixbarî kom bikin jî, bi awayekî neqanûnî roj bi roj rayeyên wan zêde bûn. Niha li qadê mîna polîsan dixebitin û bi awayekî kêfî pêşiya mirovan digirin û nasnameyan kontrol dikin.

Notirvaniya alîkariyê!

Ev pêkanîna noteran di nav civakê de rastî bertekên tund tê. Piraniya civakê pergale weke pergala AKP'ê dibîne û wê pêkanîna noteran qebûl nake. Di çend mehên dawî de li gelek deveran jî ber kontrola nasnameyê ya noteran, di navbera welaî û noteran de pevçûn derketin. Desthilata AKP'ê jî bo ku li gorî xwe wê niqaşê jî holê rake, hefteya borî tîkildarî pergala noteraniyê pêşnûmeqanûneke balkêş pêşkêşî serokatîya meclîsê kir. Parlamenterên AKP'ê di wê pêşnûmeqanûnê de daxwaz dikin ku ra-



yeya noteran bê zêdekirin. Heke pêşnûmeqanûnê bê qebûlkirinê dê ji niha şûn ve noteran karibin li tax û sûkan nasnameya welatîyan kontrol bikin. Di nav hefteyê de serokwekilê koma AKP'ê Mehmet Mûş tîkildarî pêşnûmeqanûnê daxuyanî dabû û diyar kiribû ku ew jî bo noteran karibin alîkariya gel bikin rayeya kontrolkirina nasnameyê didin noteran.

Gel jê aciz e

Alîkariya (kontrolkirina nasnameyê) ku Mûş qala wê dike di nav gel de weke îşkenceyê tê pênasekirin. Her çiqas carna wezîrê karên hundir Suleyman Soyû, bi kontrolkirina nasnameyan propaganda bike û daneyên wê mijarê parve bike jî gel jî pêkanîne gelek aciz bûye. Hin caran jî ber kontrolkirina nasnameyan a li xalên kontrolê di rêyan de bi kilometreyan wesayîti di hev rêz dibin. Ev yek li ser rêya ne bes bû, niha heman pêkanîni li

tax û sûkan jî tê belavkirin.

Bi israr dixwaze

Ji ber wê pêkanîne dibe ku di rojên pêş de pirsgerêkên gelek mezin peyda bibin. Ji ber ku noteran li tax, navçe û bajarên xwe pey-wir dikin, dibe ku wê rayeyê bi awayekî nebaş bê bikaranîn. Dibe ku noteran rayeyê jî bo tohildanê jî bi kar bînin. Li gel ku demeke dirêj e, ji ber pêkanînen noteran li ser pergala noteraniyê niqaş tînin kirin jî AKP bi israr dixwaze wê pergale berbelav bike. Wê ev yek jî gelek pirsgerêkên civakî bi xwe re bîne. Ev niqaş beriya niha jî bo pergala cerdevaniyê jî hatibû kirin.

Pergala Cerdevaniyê, di sala 1986'an de ji aliyê serokwezîrê demê Turgût Ozal ve ketibû meriyetê. Wê demê li ser wê pergale jî gelek niqaş derketibûn û hişyarî hatibûn kirin ku dê cerdevan bibin sedema pirsgerêkên civakî. Li gel van niqaş û hişyariyan jî pergala cerde-

vaniyê ketibû meriyetê û bi hezaran kes li bakurê Kurdistanê bûbûn cerdevan. Cerdevan di nav salan de tevli gelek bûyeran bûn.

Heman pergala in

Niha navê bi sedan cerdevanan di cînatyên faîlî meçhûl de derbas dibe. Li gel wê rewşê jî pergala cerdevaniyê bi salan e tê berdewamkirin û nayê terikandin. Her partiyên ku hatin ser desthilatê, pergala cerdevaniyê li gorî xwe revîze kirine û jî bo girtina dengên cerdevanan daxwaza rakirina pergale paşguh kirine.

Di encamê de pergale cerdevaniyê û noteraniyê heman pergala in. Ji ber wê yekê her du pergala jî li şûna feydê, bi dehan xesarên wan hene. Acizaya civakê ya jî her du pergala jî nişaneya wê yekê ye. Ji bo wê yekê ye kesên ku li van pergala xwedî derdikevin û wan diparêzin, kesên nêzî desthilatê ne.

Çav kor, ziman lal

Mehmet Ali Ertaş

Sansur êdî nepenî û bê nav e. Berê navê wê hebû. Berê kras û fistanê wê hebû. Zengil di stuyê psikê de bû. Dema psik dihat, dengê zengil bilind dibû. Mişkê derketibû derveyî qula (kun) xwe, bi dengê zengilê re, xwe davêt qula xwe. Xwe jî pisikê diparast. Ger ku pisikê mişkê zevt kiribûya, mişk li hewa dixwar. Mişk tune dikir. Li vir zengilî rastî ronî dikir. Hatina pisikê aşkere dikir. Lê pisik mişkê bi çav û guh naxwaze. Tiştê ku hatiye serê Halacı Mansûr, an jî Pir Sultan Abdal tînin zanîn. Li ser wê erdnigariyê hema bêje em rastî her cure rêbazên desthilatdariya zordar tînin. Tê fêmkirin ku fikra azad, cuda û muxalîf her tim bedel daye.

Sansur; veşartin û bincilkirina rastiyan e. Ji bo ku rastî neyê dîtîn û ev rastî nebe sedema dîtina qirêjî û kemêlên genî yê iktidarê û hêzên serdest, van rastiyan sansur dikin. Hêzên serdest, bi zagon û fermana rayedarên iktidar, daraz û dewletê van rastiyan bincil dikin û ji civakê vedîşêrin. Dewlet, iktidar û hikûmetên ku zordestiya xwe li ser civakê ferz dikin û dixwazin her dem serdestiyê bikin, serî li rêya sansurê didin. Destûr nadin ku hêzên dijber nêrin, daxwaz û rexneyên xwe binin ziman û parastina xwe bikin.

Sansur, amûra serdestan e ku pê bîndestan bêdeng dike. Amûra kolekirinê ye. Ji bo zilm û serdestiya xwe rewa bike naxwaze rastî ronî bibe. Naxwaze ala rastiyan hil bibe. Al azadî û ronahî ye. Azadî dijminê zordestiyê ye, ji ber ku jî rastiyan ditirsîn. Hêzên serdest û iktidarê jî ber genî û qirêj in, naxwazin rastiya wan bê dîtîn. Ji ber wê yekê jî tarîtiyê hez dikin û ji ronahiyê ditirsîn. Ji deng ditirsîn, dixwazin guhan ker bikin; ji ronîya çavan ditirsîn, dixwazin çavan birijînin; ji ziman ditirsîn, zimanan lal dikin. Aqil û mejî felç dikin û di serî de hepis dikin. Seryan dikin qereqol. Hubra pênûsan zuha dikin. Kamera û wênekêşên rojnamegeran perde dikin. Naxwazin lîstika rastiye dakeve ser dikê û hebûna xwe bidin nişan bidin.

Berê sansur dikirin, lê niha qedexê dikin. Ji Îskenderê Mezin heya Sezar, gelek sansur û qedexê xistiye meriyetê. Tirkîyê jî di warê sansur û qedexekirinan de gelek navdar e. Ji serdema împaratoriya Osmanîyan heta avakirina komarê, ji avakirina komara Tirkîyeyê heta iktidara AKP'ê, sansur her û her bi kiras û rengên cuda didome. Car caran bi zagon û biryarnamayan, car caran bi zext û tundiyan, car caran bi awayekî nepenî û veşarî hebûna xwe domandiye.

Dewleta Osmanî, di 1862'an de Midûriyeta Giştî û MATBUAT'ê damezirand. Di 1864'an de Nizamnameya MATBUAT'ê ku ji fransîyan werger kirin kete meriyetê. Ev nizamname heta îro ruhê sansurê diparêze. Di dema Abdulhamîd 2'êmin de sansur pir dijwar bû. Dîsa jî sala 1923'yan heta sala 1938'an, bi guherînen di qanûna Matbuatê de bi taybetî qedexeya beramberî weşanên siyasî diwartir kirin. Dîsa jî salên 1980'î heta 2020'an bi zagonên RTUK, OHAL û KHK'an sansura bê nav derxistin pêş. Definkirina cenazeyan tê sansurkirin û nivê şevê cenaze tînin definkirin. Çalakiyên li qada Galatasarayê û qadên din sansur dikin. Çalakiyên jî bo dîtina Gulistan Doku sansur dikin û hwd. Sansur heye lê navê wê tune ye.

Qaşo eywana bêhnvedanê ye

Navenda Nûçeyan

Plan û xebata avakirina Otagara Navçeyan a Rojava ya Amedê, dema hevşaredarên berê yê Amedê Gultan Kîşanak û Firat Anli hat destpêkirin. Berî ku otogar temam bibe, Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê, di sala 2016'an de ji aliyê wezaretê karên hundir ve hat destserkirin. Hevşaredar Kîşanak û Anli jî peywirê hatin dîrxistin û Cûmalî Atilla weke qeyûm tayînî şûna wan hat kirin. Otagar, dema qeyûmê berê Cûmalî Atilla di 9'ê tirmeha 2018'an de vebû û dest

bi dayîna xizmetê kir.

Eywana bêhnvedanê ya otogarê ku hê 3 sal di ser vebûna wê re derbas nebûye, ji ber xemsariya rêveberiya qeyûmê niha Hasan Basri Guzeloglu, ketiye rewşeke wisa ku nikare bê bikaranîn. Kursiyên nûpînû ku beriya 3 salan li eywanê hatine bicihkirin, ji hev ketine û boyax û alçiya qartîyan bi ser wan de hatiye. Li gel ku xizmeta li otogarê di saetên şevê de bi dawî dibe û nayê dayîn jî deriyên eywanê bi şev û roj vekirîne. Ji ber ku eywan di wê rewşê de ye van rojên bi sir û seqem kes nikare li eywanê bêhna xwe vede.



Revandina sivîlan li Efrînê didome

Tirkîyê, 20'ê Çileyê 2018'an bi komên girêdayî xwe ve êriş bir ser bajarê Efrînê yê rojavayê Kurdistanê û di encamê êrişên 2 mehan de bajar dagir kir. Di êrişan de bi sedan jin, zarok û sivîl hatin qetilkirin û bi hezaran kes jî cih û warên xwe bûn.

Ji destpêkê heta niha kesên ku li Efrînê mane jî bi êriş û îşkenceyêke dijwar re rû bi rû ne. Komên girêdayî Tirkîyeyê bi ser malên kesên ku li Efrîn û navçeyên wê mane de digirin û bi berdêla pereyan wan direvînin. Heftaya borî li gundê Maratê yê Efrînê dîsa 10 kes jî aliyê komên çekdar ve hatin revandin.

Di nav kesên hatin revandin de jinek jî hebû. Kesên hatin revandin temenê wan di navbera 25 û 40 salî de ye. Navên sivîlên ku hatin revandin wiha ne: Rêzan Elî, Seîd Xelîl, Elî Henan, Elî Xelîl, Rûken Heyder, Ehmed Evdo, Salah Ebdulrahman, Salah Memo, Ehmed Omo û Ehmed Bozan.

Komên çekdar, piraniya kesên ku direvînin îşkenceyên giran li wan dikin û wêne û dîmenên wan dikişînin û jî malbatên wan re dişînin. Bi wê rêbazê pere jî malbatan dixwazin. Malbatên ku pere nedin jî îşkenceyên giran li xizmen wan dikin û wan dikujin. **EFRÎN**



MIXABIN XELEKA ŞÊWEKARIYA KURDÎ YA TAYBET NEHATIYE DURISTKIRIN

Divê em bedewiyê nişan bidin

→ Rizoyê Xerzî

Hunermend alav û keresteyên xav û xwezayî ji civakê distîne û di raman û xeyalên xwe de, wan ji nû ve diafirîne û careke din bi şewazeke din vedigerîne civakê. Ew çand e, huner e û ziman e, ji ber ku ev dibin gewdeyê neteweyê. Ji aliyekî din ve divê ku em ji bin bandora siyasê derkevin û li doza kurdan binihêrin wek dozek çandî, hunerî û mirovahî. Wê demê em ê dikaribin hemû sermîyanên wê, ji folklor û wêjeyê û hunera wê bikin berhemên modern û pêşkêşî cîhanê bikin.

LUKMAN
EHMED
kî ye?

Lukman Ehmed di sala 1972'an de li bajarokê Dirbêsiyê yê rojavayê Kurdistanê ji dayik bûye. Şewekarê kurd heta niha tevli gelek pêşangehên tekakesî û komî bûye. Li kêleka şewekariyê di Radyoya Dengê Amerîkayê de pêşkêşvaniya bernameyêke hunerî jî dike. Her wiha em navê wî li bin xêzên li ser bergên gelek pirtûkên kurdî dibînin.

Şewekar û rojnamevanê kurd Lukman Ehmed ku salên dirêj xwe daye ser şewekariyê û di vî warî de bûye xwedî berhemên bedew û bi xêzên xwe tu caran xwe durrî rojeva kurdan nehiştiye. Ew her dem bi tablo û xêzên xwe li welat û derveyî welat bûye mêvanê bi dehan pêşangehan. Me xwest ku Ehmed vê heftêyê bibe mêvanê Xwebûnê û me pê re ev hevpeyvîn kir.

Lukman Ehmed kengî û çawa dest bi şewekariyê kir?

Ji zarokiyê ve hunera şewekariyê bala min kişand, bêyî ku ez dizanibim bê ew çî ye û çawa ye. Lê behreya min a zarokiyê bi kişandina xêzan û çêkirina wêneyan bala mamosteyên dibistana seretayî li bajarokê Dirbêsiyê kişandibû. Hinekî bala min kişandin û bawer dikim ji wê demê ve ez bûm evîndarekî neçar ji xêzkişandinê re. Ji berê ve ew pencera min a bi tenê bû ji bo derbirîniyên xwe binim der.

Destpêkê te hunerên kîjan şewekarên kurd nas kirin û bandoreke çawa li ser te kir?

Li bajarê Dirbêsiyê hunermend Îbrahîm Heyderî hebû (merivê bavê min bû, ew di temenê bavê min de bû). Ew kesekî taybet bû di civatê de û dema ez bi malbatê re diçûm serdana mala wan, wî bala min pir dikişand, bêhtir kesayeta wî bû di wê demê de wekî rewşenbîr û mirovekî taybet dihat naskirin.

Li rojavayê Kurdistanê û Sûriyeyê ji salên 50'î û 60'î şewekarên kurd ên bi nav û deng hebûn. Gelo sedemên pêşketina vê hunerê di nav kurdên Rojava de çî bûn?

Ez bawer dikim bi rewşa Sûriyeyê ya giştî ve girêdayî bû ku pêlek ji guhertinên mezin di Sûriyeyê de dibûn. Yek ji wan bandora komunîzmê bû li ser nişên nû ji xort û keçên kurdan li hemberî gurbûna pêla neteweperestiya erebî ya bi bassî û nasirîyan. Ya din jî huner bû alavê di xebata kurdî de ji bo mafê gelê kurd ku rewşenbîrên kurdan di wê demê de li nav civata kurdî belav dikirin.

Di nav kurdan de bi giştî kîjan şeweyê hunerê li pêş e û şewekarên kurd bêhtir nêzî kîjan dibistanên hunerî yên şewekariyê ne?

Di nav beşên hunerê de bi giştî, hunera dengbêjî yan jî stranbêjiyê li pêş bû di nav kurdan de, lê şewekarî yan nîgarkêşî di demên dereng de di nav civatê de belav bû. Ji bo şewekariyê û şewazên wê (dibistan) ya herî belav bû û cihê xwe di nav şewekarên kurdan de girt, şewaza derbirîni bû (expressionism); ji ber li ser hest û helwestan tê avakirin.

Tu şewekariya Kurdistanê çawa dibînî, heger mirov bi şewekariya cîhanê re muqayesekê bike di çî astê de ye?

Bi rastî şewekar û hunermendên kurd li seranserê Kurdistanê, di hunera şewekariyê de cihên pir taybet girtine û di wan welatên ku dijî de. Lê mixabin heta niha şewaz an xeleka şewekariya Kurdî ya taybet



nehatiye duristkirin. Belê li ser asta kesayetî, hunermendên kurd pir serkeftî û zîrek in, navên mezin dane hunera şewekariyê li Kurdistanê û seranserê cîhanê jî. Xeyala wan a bejî û hostatiya wan di bikaranîna rengan wan ciyawaz dike û mezinayiyekê dide wan.

ji ber ku karê saziyan di wan de tune ye. Lê bera em geş bin bin. Ez ji aliyê xwe ve her dem di xebatên xwe de hewil didim ku pêwendiyên bi hev re ava bikin. Em hevdu baş nasakin, yekem gav divê haya me ji hevdu çêbibe û em xelekek hunermendî, çandî di nav rewşenbîr û hunermen-

mirov li gelek tiştan vedike û mirov derbasî cîhanek din dike. Êdî du rê li pêş meriv dimînin; an nasnameya xwe û koka xwe bide pêş û bi cîhanê bide naskirin, an jî xwe ji bîr bike û bê helandin di civaka nû de. Ji bo min serboryek zengîn bû bi xweşî û nexweşiyên xwe ve, ez niha zêdetir diêşim, belê ez xwe bêhtir nas dikim û dizanim ku bêwelatî û hezkirina ji welêt çî ye.

Pirsa dawî, peyama we ji bo şewekar û hunermendên kurd çî ye?

Peyama min, ku em serbilindiya xwe bi neteweya xwe bikin. Kurd û Kurdistan ne kêşeyek siyasî an bi kêşeyên partiyên ve girêdayî ye, ew çand û sermîyana dîroka mirovatîyê ye. Em baş xwe nas nakin û nizanin dîroka xwe bixwînin. Ka berê xwe bide stranên kurdî yên resen, ew ne bi kurdan tenê ve girêdayî ne, ew bi mirovahiyê ve girêdayî ne. Divê em wê ciwanî û xweşikbûna wê ji bin toz û gemara salan derxînin û bi awayekî nûjen û bajarî bi kar binin û pêşkêşî cîhanê bikin. Mark Chagal karîbû çîrokên Tewrata cihûyan, bike baştirin keval di cîhanê de. An jî Verrocchio mîtolojiya romanî yan çîrokên Incîlê kirin baştirin berhemên hunerî di cîhanê de... Divê em ji bin bandora siyasê derkevin û li doza kurdan binihêrin wek dozek çandî, hunerî û mirovahiyê. Wê demê em ê bikaribin hemû sermîyanên wê, ji folklor û wêjeyê û hunera wê bikin berhemên modern û pêşkêşî cîhanê bikin. Divê em ji xwe şerm nekin û dizanibin ciwanîya xwe diyar bikin.

Ji bo hevpeyvînê em spas dikin.



Rol û rista şewekariyê di pêva joya netewebûnê de çî ye û tu dikarî ji bo neteweya kurd vê binirxîni?

Ez her dem dibêjim ku hunermend wek filter e, alav û keresteyên xaf û xwezayî ji civakê distîne û di raman û xeyala xwe wan ji nû ve daifirîne û careke din bi şewazeke din vedigerîne civakê. Netew, çand e, huner e û ziman e, ji ber ku ev dibin gewdeyê neteweyê. Ji bo kurdan û rewşa wan a siyasî ne aram e û tevlihev e, huner û çand (li gor nêrîna min) rêka herî baş e ji xebatê re. Ji berê ve dikarin pênasîne bi neteweya kurd bikin û tenê ne wek dozek siyasî lê wek dozek mirovatîyê jî bidin naskirin.

Şewekarên kurd çawa haya wan ji hev çêdibe, gelo sazî, kovar an jî bi kêmanî malpereke ku wan li hev bicivîne heye?

Ev pîrsek pir girîng e. Hunermendên kurd li Kurdistanê yan jî li diyasporayê jî ji hev durr in û agahî û karên hevbeş di nav wan de, ne di asta ku tê xwestin de ye. Xebat û çalakîyên dibin an bi rêka yekdayî ne, an jî ji aliyê partiyên siyasî ne û ew herdu jî nikarin tiştêkî ava bikin;

dan de ava bikin. Bêyî tu nav an jî rêxistinekê, tenê pêwendiyên deynin û bibin pira di nav hev de. Em hevdu bi hev bidin nasîn, ev gawekî pir girîng e. Divê em ji hestên çavnebarî, an jî zikreşiyê rizgar bibin û bawerîya me bi me bê.

Tu jî niha li xerîbiyê dijî, tu dikarî behsa hestên xwe yên di vî warî de bikî, xerîbî bandoreke çawa li te dike?

Xerîbî tiştêkî zor e, hestên te diguherîne, êşa te zêde dike û guherîne di nêrîn û boçûnên te de jî çêdike; lê ji aliyekî din ve jî çavê



Ax! Welato

Ayhan Erkmen



Gundê Şatiroxliyê

...
 Bira ez e evd im,
 Evda serreş û diljar,
 Derdê neman çawa tevdim.
 Wexta padşê zulm, xezevê,
 Anî koka bavê min,
 Cinyaz pê da dane tavê,
 Qeland arg û avê min*

Ev cih û warê ku bûye mijara helbesta helbestvanê nemir Şikoyê Hesen û ketiye ber xezeva padşahê zilimkar, gundê Şatiroxliyê ye. Şatiroxlî girêdayî navçeya Dîgora Qersê ye.

Gundê Şatiroxliyê ji Qersê 30, ji Dîgorê 20 kilometreyan dûr e. Li alî rojava, gund pala xwe daye girê Şatiroxliyê. Rasta pêşiya wê; çayira axê û kirê keraliyê ye, ev rast heya sînorê gundên Bazarcix, Gulheyran û Eylasincos fireh dibe. Li hêla bakur Bazarcix û li hêla başûr jî Emançayir û Şîrînkoy ji Şatiroxliyê re cîrantiyê dîkin. Riya gundên Şîrînkoy û Emançayirê di nav gundê Şatiroxliyê re derbas dibe, çemê Çaço di bintara gund re dikişê. Mergên peşiya gund, di mehên bihar û havînê de bi gulên reng bi reng dixemilîn.

Li gorî arşîvên rûsan, di sala 1882'yan de 26 malbatên êzîdî, ji herêma Eyntabê (Dutaxê), ji destê Roma Reş û Hecî Ūsiv Paşayê dûvelangê wan direvin, tî û li gundê Şatiroxliyê bi cih û war dibin. Wê gavê di gundê Şatiroxliyê de 203 kes dijîn; ji van 113 kes mîr û 90 kes jî jin in. Gundî debara xwe bi xwedîkirina heywanan û çandiniyê dîkin.

Ezidiyên hatine vir, ji eşîra Sîpkî û berê Mûsêsaniya ne. Du jî malê Şerqiyân hene; mala Reşît û mala Teyo. Ji gund re malmeziniyê Çaçanê Mûso dike.

Hem bakurê gund hem jî li ser girê başûrê gund, xirbeyên pir kevn hene. Dixuyê ku hêj berî hatina civaka êzidiyan gund li van deran avakirî bûye. Lê êzidiyan ne li ser van xirbeyan; gund, di bintara girê Şatiroxliyê de ava kiriye. Ev gir tîra xwe bilind e û gund jî sir û seqama zivistanê diparêze. Gel ji xirabê alî başûr re dibêje kela Şatiroxliyê. Ev der wek ziyaretgeh e. Kevirêkî qul li vê derê heye. Şênîyên gundên derdorê, hê jî tî û ser wî kevirê qul, qurbanan şerjê dîkin û di kêvir re derbas dibin. Li gorî baweriyên; ên gunehkar diwerimîn û nikarin derbas bibin.

Av û kaniyên vî heremê pir in, ji ber wê qasê deh sal berê, ji bo avdana erdê, bendavêk di bintara kela Şatiroxliyê de hatiye çêkirin. Avê gundên Zeynik, Tirmaşîn, Emançayir û Şîrînkoyê bendavê dadigirin lê bi derbiharê re bendav jî pe-



şiya lêhiyên berfa zivistanê li berxwe nade û derê bendavê vedîkin.

Kurdên êzîdî bi qasî 36 salan li vî herêmê û li vî gundî dimînin û pey şerê cîhanê yê yekemîn ber bi Sovyeta berê koçber dibin. Zelûlî û neheqîya di dema rev û bezê de hatiye serê şênîyên Şatiroxliyê hê jî tê gotin.

Dema koçberiya êzidiyan, kurdên mîsilman jî ji Elegezê, Rewanê koçber dibin derbasî vî alî ava reş dibin. Ji wan qismek, hatine û ketine vî gundê Êzidiyan, hê jî di Şatiroxliyê de toremê wan dijîn.

Di gund de avahiyan jî dema êzidiyan hema bêje qet nemane. Yek du heb tenê mane. Ji wan yek ya mala Biro ye. Avahî li bintara riya Şîrînkoyê ye. Der barê vî malbatê de meselek jî tê gotin. Keçeke Biro ya bi navê Şerê, hêj berî revereva 1918'an, ji ber bi zorê dane mîr, ji mala bavê xwe diqete û diçe hêla Qaqizmanê û li wir dizewice û dimîne. Dema qîza xama Şerê û li Şatiroxliyê mala bavê xwe ye; gundiyan jî gundê Arpeliya Dîgorê tî û di ser Şatiroxliyê re derbas dibin û diçin zozanê pişt girê Şatiroxliyê. Gundê şatiroxliyê jî xwe zozan e, ji ber wê naçin zozanan. Şerêya bedew û delaliya mala bavê xwe, tiranê xwe keç û bûkên Arpeliyê dike, dibêje 'keçikno, jinno, ez Şerê me Şerê, ez petî û dotîne nizamim, lê def û dehat û reqasê ji min bipirsîn, ji min.' Niha nebiyên Şerê li malxalana xwe ya êzîdî digerin. Ger ku ev nivîsa me bibe sebeb û malbavistana Şerê an jî Êzidiyan me yê Şatiroxliyê, bi me re tekiliyê danîn dibe ku em bibin wesîle, wekî sed sal şûnda xal û xwarzî bigihîjin hev.

Ev gund di heman demê de gundê mal-

bata helbestvanê nemir Şikoyê Hesen e. Di dema revereve de Hesenê bavê wî hêj 12 salî buye. Ew helbesta ewil a me nivîs pê daye destpêkirin, bi serpêhatiyên bavê wî û malbata wî ne. Şiko ew êş û janên di dema fermanê de hatine jiyîn, bi gotinên keçeke ji fermanê reviyaye, di helbesta 'Du Gul' de bi hostayî û dirêj dirêj aniye zimên. Helbestvanekî mecnûn e Şikoyê Hesen, Zîn û Xeca wî, ziman û welatê wî ne. Ji her du helbestên wî yek, nişaneyê vî eşqê ye. Jê dipirsîn ku 'ji vî dinyaya kaw nazikî/ çi hiz dikî' bêguman û bê destûr, dibêje 'bi kurdî'. Ew strana ku hozanê nemir Aram Tigran dibêje û bûye sirûda zimanê me ya bi navê 'Zimanê Kurdî' dengê dengvedana eşqa dilê Şikoyê Hesen e.

*Bi xeml û rewş e
 Şêrîn û xweş e
 Şêrîn û xweş e
 Zimanê kurdî
 Bi xweş awaz e
 Letîf û naz e
 Letîf û naz e
 Zimanê kurdî*

Şikoyê Hesen xemginiya bêwelatbûnê, ji dil û ji kûr ve hîs dike. Mixabin bi xwe jiyana xwe bi dawî dike û emrekî hêj ciwan, ji vî dinyaya kambax û derewîn koça xwe bar dike. Birayê wî, dengbêj Hemoyê Hesen li pey mirina bêwext û şewat a Şikoyê birayê xwe, straneke pir bi jan çêdike, dibêje ku;

*'Cahiltî neçe
 tê kuda herî
 malşewitî gava tu herî venagerî
 cahiltiya zêrîn tê kuda herî'*

Çiqas rast e nizamim, lê çend kesên cuda cuda, ji min re gotin ku me ji Ehmedê kurê Hozan 'Aşiq Veysel Şatiroxlî' bihîstiyê, şikra ku wî gotiye 'bavê min ji şatiroxliyê ye.' Ya tê zanîn Aşiq Veysel di sala 1894 de li Sêwazê hatiye dinê. Êdî nizamim, malbata wî ya êzîdî bû, ji cîmûeta xwe qetiyên çûn, an jî ew kesên ku ji berî êzidiyan di şatiroxliyê de jiyane. Hewcedarî bi lêkolîneke baş heye.

Di gundê Şatiroxliyê de niha 70 malbat hene û 550 kes lê dijîn. Goristana gund hêj goristana dema êzidiyan e. Miriyên sedsale di hembêza hev de radizên. Gund zêde koçber nebûye, debara xwe mîna salên berin bi xwedîkirina heywanan û bi çandiniyê dîkin, hal û wextê gundiyan baş e. Gundî gelek mêvanperwer in û bila riya we bi vî gundî bikeve. Ev gund gundê bav û kalan e.

Ax! Welato



Çavkanî:

Şikoyê Hesen : Payîz û Ba


Heciyê Cindî: Hawar

Wezîrê Eşo : Îtbarî

Candan Badem: Vilayeta Qersê

Rohat Alakom: Kurdên Qersê





Kewê Redkan

Diranê Zelêxanê

Ev çendeke ez alikariya kal û pîran dikim. Her roj rûniştina li malê ez hetikandim, rabûm vir de û wê de min cihekî xweş dît, hema li gorî min e. Sibehê zû radibim, tûrikê xwe dadigrim û berê xwe didim mala kal û pîran. Di serî de kêfa wan ji min re nehat, ew her tim rûyê çend kesan dibînin û bala xwe dane ser wan. Min got; "Heyran piştî demekê hûn ê ji min hez bikin, ew dem were qet hûn naxwazin ji min dûr bikevin." Wan bi van gotinên min kir miremir, rûyê xwe daxistin û piştî xwe dan min, gotin ev kî ye hatiye tevgera me xera bike, em tu caran destûrê nadin vê yekê. Dema ez li wan dinihêrim tu dibêji qey tevgera siyasî, mezin û karê veşari dikim.

Min xwe bi xwe got; "Hûn bisekinî ez ê we çawa binim rê, hûn ê çawa ji min hez bikin û tu carê hûn ê nexwazin dev ji min berdin..." Sibetirê ez rabûm min xwe xemiland, careke din tûrikê xwe tijî mewîj, gûz, hêjîr û bastêq kir û berê xwe da mala kal û pîrên xwe.

Ez ketim hundir, min tûrikê xwe danî ser kursiyekî, ew mewîjên tê de hêdî hêdî derxist û danî kêleka xwe, qet bi wan re mijûl nabim, hema bi xwe re mijûl im. Min dît hêdî hêdî ber bi min ve tîn, yekê got; "Ew çi ye di tûrikê te de?" Min got, heyran tûrikê min ji bo we ye, hema hûn çi bixwazin di tûrikê min de hene. Dema we xwest hûn dikarin lê binihêrin û tam jî bikin, lê tama wan pîr xweş e, ger hûn bixwazin ez ê ji bo we hinekî veqetînim. Her yekê destê xwe avêt tûrik, di nav de çend heb hêjîr û gûz avêtin devê xwe, gotin diranê me tune ne, em nikarin bicûn, divê tu vana hinekî nerm biki û dûra bidî me.

Lê diranê we tune ne, hûn xwarinê çawa dicûn? Ger hûn xwarinê xwe necûtî daqurtînin ew ê medeyê we biêşe û hûn ê nexweş bikevin! Di nav me da tenê taximê diranê Zelêxanê heye, ew jî dema bi me hêrs bibe diranê xwe nade me, lê gava ku dilê wê xweş be taximê diranê xwe dide me, em dor bi dor bi wan diranê Zelêxanê xwarina xwe bi lez û bez dicûn.

Ez pîr li ber xwe ketim bi van gotinên wan. Min tûrik û mûrikê xwe hişt, ez çûm nav bajêr cem dirançî, ew dirançî xortekî bi bext e, bi xîret e, got; "Çiroka te û wan kal û pîran dilê min êşand, ez ê a niha herim wir û diranê hemûyan çêkim, heta sibê her yek wê taximek diranê wan hebe, bila dilê te rehet be." Ez çûm malê, lê heta sibê xew neket çavê min, di berbanga sibê de ez çûm ber derî min dît hemûyan xwe dane ber derî, keneke xweşik li ser rûyê wan, ez pêşwazî kirim. Di nav wan de tenê Zelêxan bi pirçî bû, kesek li dora wê nedihat û nedîçû, ji ber ku hemû bûne xwedan diran.

Min ji wan re got; "Heta doh we bi diranê Zelêxanê nanê xwe dicût, niha hûn hemû bûne xweyî diran û ew li ber xwe dikeve ku hûn êdî guh nadin Zelêxanê. Herin cem wê, jêra bêjin dema taximê diranê me winda bû em ê dîsa bi diranê te nanê xwe bicûn, kî dizane, dibe ku diranên me jî bi kêrî tiştêkî neyên! We bidita bi van gotinan kêfa Zelêxanê çawa hate cih. Ez dizanim di dilê xwe de digot; "Di demek nêz de hûn ê dîsa li dora min bicivin û taximê diran ji min bixwazin... Zelêxan dibêje diranê min zêr in û mircan in. Ez jî wisa difikirim.

Li ser bextê Zilfoyê simîtfiroş be

Zilfo li taxa Ofisa Amedê simît difrotin û taxa ofîsê di bin serweriya wî de bû, nedîhişt ku kesek din li wir simîtan bifiroşe. Carekê simîtfiroşek hat taxê û dest bi firotina simîtan kir. Piştî wê êdî simîtfiroşê ciwan li ser hev çend rojan hate taxê û simît firotin. Ew yek jî ne bi kêfa Zilfo bû. Diviyabû ku Zilfo destê xwe bavêje vê mijarê û wê çareser bike. Navbera Zilfo û dikandarên taxê jî gelekî baş bû, her kesî jî Zilfo hez dikir. Dema Zilfo dît ku dîsa ew simîtfiroş hat êdî Zilfo dest pê kir dikandarên taxê li dijî wî simîtfiroşî birêxistin kir. Zilfo hate ba parfumfiroş û jê re got: "Tu dizanî ev simîtfiroşê hanê xayin û ajan e. Mêrik got, "De na lo Zilfo ev fiqîrê xwedê û ajantî."

Zilfo got: "Ma heke ne ajan ba ji Elezîzê heta vir jî bo firotina simîtan dihat. Ma nikaribû simîtan li bajarê xwe bifiroşe. Ez bawer im ku wî simîtfiroşî navê we tevan daye dewletê ,hay jî li nav hemû dikandaran hate belavkirin ku haya wan ji simîtfiroşê nû hebe û dibe ku ajan be, lewre li hêviya tevgera wî ya şaş mabûn.

Zilfo: Keko we dît wê rojê ev simîtfiroşî li erebeyê reş siwar bû. We nedît?

Dikandar: Na wele min nedît.

Zilfo: Bila haya her kesî jî wî

hebe, li min gotin.

Roja din neh-deh dikandar li hev civiyan û li hêviya simîtfiroş rawestiyayan da ku wî bigirin û ji taxa xwe derxînin. Simîtfiroş hat, dikandar lê civiyan û ew girtin. Zilfo ji paş ve li wan mêze dike, dikandar jî tev li simîtfiroş civiyane. Pepûkê simîtfiroş şaş mabû nizane ku çi mesele ye.

Simitfiroş: Keko welehî min tiştêk nekiriye.

Dikandar: Çawa te tiştêk nekiriye ûlan, tu ji Elezîzê heta vir jî bo simîtan bifiroşî hatiye?

Simitfiroş: Abê welehî ez ji Amedê me, ji taxa Baglarê me ne ji Elezîzê me.

Dikandar: Çawa tu ne ji Elezîzê yî?

Simitfiroş: Keko welehî min Elezîz bi çavên serê xwe nedîtiye, tu caran neçûme wir jî.

Dikandar: Zilfo got ew jî Elezîzê ye. Ji wir hatiye simîtan li vir difiroşe. Her roj li erebeyê polîsan siwar dibe.

Dikandaran mesele fêhm kir li hev mêze kirin û pirçîni bi wan ket, kenîyan. Dikandarê parfumfiroş jî ber nû hatibû taxê baş Zilfo nas nedikir. Dikandaran fêhm kir ku ew mesele ji bin serê Zilfo derketiye, her yek simîtek ji lawik kirin û berê xwe dan dikanên xwe.



Zarokên pîrê

Pîrejinek li ber dîwarê mala xwe rûniştibû û diponijî. Xuyaye ku derd û kuleke wê heye. Cîrana wê hate li kêleka wê rûnişt û jê re got "Xêr e pîrê, çi derd û kulên te hene."

Pîrê: Li hêviya zarokê xwe me, bû ber êvarê hîna nehatine malê.

Cîran: Xwedê emrê wan dirêj bike, çend zarokên te hene?

Pîrê: 4 kurê min hene.

Cîran: Tu herî zêde ji kîjanî hez dikî, yê herî mezin an yê herî biçûk?

Pîrê: Dema li wan her çaran dinihêrim, wekî yek kesî bibînim û dema ku li yekî ji wan dinihêrim wekî ku her çaran dibînim. Lê dema ku tiştêk ji min re lazim be, ez yek ji wan kûçik kurê kûçikan nabînim.

Di dîyalektîka efendî û kole de

Koleyên ku mankurtîze bûne bi muzîkê dikarin ji nû ve dest bi hîskirin û fikirinê bikin. Ancax muzîk dikare hestê tolgirtinê ji nû ve zindî bike

Welat Ramînazad

Têkilîya dagirker û dagbûyî, kolonyalist û kolonîbûyî, serdest û bindest, stemkar û stembar, jin û mîr her çiqas di nav xwe de û ji dîyalektîka efendî û kole çîyawazî û taybetîyên wan hene jî di kokê de digihêjin dîyalektîka efendî û kole. Ji ber vê yekê, em dikarin wan tîkilîyan di ser dîyalektîka efendî û kole re bixwînin û binixwînin.

Welatên kolonyal û post-kolonyal ji serpêhatiyên tîkoşîna serxwebûnê, epîstolojîyên zanistî û edebî yên hev ên dij-kolonyal sîd werdigirin. Berhem û metnên nivîskarên wekî Frantz Fanon, Aimé Césaire, Achille Mbembe, Steve Biko, Albert Memmi, Toni Morrison, Ngûgî wa Thiong'o, Chinua Achebe, Gayatri Chakravorty Spivak, Homi K. Bhabha, William Butler Yeats... di welatên kolonyal û post-kolonyal de tîn xwendin û tîn muneqaşekirin. Kiryar û tîkilîyên civak û takekesan li ser berhemên wan tîn analîzkirin û fehmîkirin û ew referans tîn dayî.

Gelo welatên kolonyal ji serpêhatî, felsefê û tarzên muzîkên hev çiqas îstîfade kirine? Bi raya min, bi qasî ku ew ji literatûrê hev ên dij-kolonyal îstîfade dikin ewqas ji muzîkên hev îstîfade nekirine. Sîdwergirtin û îstîfadekirina ji muzîkê hatiye piştguhkirin û îhmalkirin. Di peywendîya kurdan de wek mînak dîroknasek, mirovnasek, civaknasek an jî muzîkjenekî/e kurd, li ser muzîka welatekî kolonîbûyî hema hema qet xebat û lêkolîn nekiriye: Meselen welatên kolonyal ên efrîqayî bi muzîkên wekî blues, jazz, rock, reggae li ber xwe dane. Ji bo wan muzîk bûye amraza herî xurt a tîkoşînê. Ramana min ev e ku heger xwedî van tarzên muzîkên baş nebûna piranîya efrîqayîyan dê xwe bîkûştana. Kurd, ji muzîkên efrîqayîyan çî fêr bûne, çî sîd wergirtine, li muzîka xwe çî zêde kirine? Wekî tarz çend muzîkjenên kurd tenê bi rock, jazz û bluesê muzîk kirîne,



ewqas. Ji bilî rockê bi tarzên jazz û bluesê ne bi dewamdarî, tenê bi kurt-demke çend muzîkjenan muzîk kirîye. Pîrsa din ji felsefeya wan tarzan çiqas hatiye fehmîkirin û îdraqîkirin ku muzîkjenên kurd bi wan tarzan muzîk kirîye? Blues, jazz, rock, reggae ji nav welatên dagirbûyî û jîngehên wan derketine û bûne gerdûnî. Çîma bi qasî wan tarzên muzîkên baş ji nav kurdan jî tarzêke muzîkê derneketîye an jî dengbêjî nebûye gerdûnî. Çîma me nekarîye dengbêjî bikin gerdûnî? Di encamê de gelek tişt hene ku muzîka kurdî ji muzîka efrîqayîyan û welatên kolonyal ên din fêr bibe û sîd ji wan werbigire. Ji bo vê jî, divê em hem xebatên ku li ser muzîkên welatên kolonyal û post-kolonyal hatine kirin wergerînin zîmanê xwe, hem jî em li ser wan xebatên nû bikin.

Tesbîta Ehmed Huseynî

Di sala 2014'an de li Amedê, li pirtûkfiroş a Aramê, ez çûbûm gotûbêja şairê kurd Ehmed Huseynî. Di gotûbêjê de, tesbîta Ehmed Huseynî ya "Di tîkilîya serdest û bindest de serdest berî her tiştî dixwazin tune bikin ku; bindest nikarin bi zîmanê xwe hîs bikin û hestîyar bibin" qet ji bîra min naçe. Di dîyalektîka efendî û kole de fonsîyona muzîkê ji her tiştî

giringtir e. Ehmedê Huseynî bi tesbîta xwe ya jor giringiya muzîkê nîşanî me dide. Çîmkî di cewhera muzîkê de hîs û hest heye. Muzîk dilê hîs û hestan e. Bê muzîk hîs û hest dikevin jîyana nebatîyê. Ji ber vê efendî dixwazin muzîka koleyan tune bikin ku nikaribin hîs û hest bikin. Hest û hîsê ku efendî berî her tiştî dixwazin tune bikin tolgirtin e.

Tolgirtin çî ye? Çî qureyên tolgirtinê hene? Tolgirtin edelat bi xwe ye. Tolgirtin çareserîkirina neheqî, mazlumbûna xwe ye, pêkanîna wekhevîyê ye. Tolgirtin ne tenê qîsasa bi qîsas e. Lê li vir problemeke mezin a nayê çareserîkirin dest pê dike. Felsefeyê jî hêj nekarîye vê problemê çareser bike. Lê belê kole dikare bi sînema, edebîyat û hunerê jî tola xwe hilgire. Cihûyan ji bo almanan "jûrên gazê" çenekirin lê tola xwe ji almanan wergirtin. Tolgirtin; pêdanqebûlîkirina qetlîman, barbarbûn, weşbûn û zalimbûna efendî ye.

Ji bo tolgirtinê hêz

Ji bo tolgirtinê hêz û qewet hewce ye lê xwebawerîya kole ewqas şikesîye ku hêza wî ya xwedayî hebe jî ew xwe bêhêz û qewet îzane dike. Neçarî û bêhêzbûn û kêmbûna koleyî Xweda diafirîne. Lewma rola Xweda negatîf

û tiralker e. "Me dev ji tolgirtinê berdaye, me ew hewaleyî Xweda kirîye." Bi îfadeyeke vî rengî afyonbûna Xwedayî nîşan didin. Di dînan de gotinên wekî nîfir, hewalekirina Xweda mînak in.

Koleyên xwedî birewerî û hesta tolgirtinê, çiqas bêhêz û bêderfet bibin jî dikarin xwe azad bikin. Lê koleyên ne xwedî birewerîya tolgirtinê, hêza wan a Xwedayî hebe jî nikarin xwe azad bikin. Zîndîbûna hesta tolê, tê wateya xwe-nîv-azadîkirinê. Hesta tolgirtinê, daxwaz û arezû û îradeyê azadîyê ye. Hesta tolgirtinê ne obje, dike subje. Di tîkilîya dagirker û dagirbûyîyan de nebûna hesta tolgirtinê ya ji dagirkeran jî tîkşikestin û bêbabawerîyê ye, ji ber vê "dema ku dagirbûyî nikare li hemberî dagirker şer bike, di nav xwe de li dijî birayên xwe şer dike" ev tesbîta Fanon teyîd dike. Ji ber ku dagirbûyî bi xwe ne bawer e ku li hemberî dagirker şer bike, ji ber wê li hemberî birayên xwe yên biçûk şer dike. Ji ber tîkşikestin û bixwenebawerîyê, xwe dikin humanîst û aşîxwaz. Ne wêrek in ku behsa tolê bikin.

Mirov dema ku nekarî tola xwe bigire gelo ev mirov dikeve derûniyeke çawa, kesayetîyê û karaktereke çawa derdikeve holê? Tolnegirtina xwe xwebûna mirov dike, xurûra mirov birîndar dike, mirovî ji mirovbûnê derdixe, girambarî namîne. Bixwenebawerî, tîkşikestî, teslîmkirî, ji qral zêdetir dibe qralgir, mankurtîze dibe. Di filmê Quentin Tarantino, Django Unchained (Zincîrsîz) de sehneyeke wilo heye: Koleyekî reşîk ê pîncî salî, ev pîncî sal in ku her roj rîyatê efendîyê xwe traş dike. Lehengê filmî Cengo ji vî koleyî dipirse: "Di nav van pîncî salan de tu qet rojekê nefîkirî ku qîrika efendîyê xwe jêbiki?" Nefîkirî, kolebûn jî tam ev e: Mankurtîzebûn e.

Koleyên ku mankurtîze bûne

Di navbera muzîk û bîr û ruhê mirovî de tîkilîyeke çîyawaz heye: Tu huner bi qasî muzîkê nikare bikeve kûrahîya bîr û ruhê mirovî. Hem di bîra şexsî û kolektîf de û hem jî di ruhê mirovî de tiştên vemirî zîndî dike û ji nû ve diafirîne. Koleyên ku mankurtîze bûne bi muzîkê dikarin ji nû ve dest bi hîskirin û fîki-

rînê bikin. Ancax muzîk dikare hesta tolgirtinê ji nû ve zîndî bike.

Muzîka rock, xwe li ser serhildêrî û berxwedêrîyê ava dike. Di cehwera serhildêrî û berxwedêrîyê de hesta tolgirtinê heye. Kesên ku di dilê wan de hîsa tolgirtinê heye dikarin bibin serhildêr û berxwedêr. Çîyawazî û resenîya muzîkjenên rockê, angos resenî û çîyawazîya Sîya Şevê ji vir derdikeve holê. Çîmkî her kom û muzîkjenê rockê nikare hesta tolgirtinê zîndî bike, ji ber vê tenê xwe li ser serhildêrî û berxwedêrîyê ava dike.

Fonsîyona muzîkê

Di dîyalektîka efendî û kole de fonsîyonên muzîkê çî ye? Du fonsîyonên muzîkê hene; negatîv û pozîtîv. Fonsîyona negatîv kolebûnê meşrû dike, muzîk tenê xweîfadekirin û xwetesdîqîkirin e. Lê di fonsîyona pozîtîv de muzîk azadker e. Kolonyalist, her tim dixwazin pêşîya muzîka azadker bigirin. Ji ber vê, muzîka koleyan tî bîkîkkirin, xirabkirin, dejenerekirin û bêfonsîyonkirin. Di dîyalektîka efendî û kole de fonsîyona muzîka Sîya Şevê azadker e.

Gelo gelemperîya muzîka Sîya Şevê azadker e? Berî vê nivîsê derbarê Sîya Şevê de min çî hevpeyvîn û çî nivîs li ser medyaya civakî û malperên wekî "ekşî sözlük" û "tirşik"ê dîtî, min xwendin. Min ji hevpeyvîna Sîya Şevê wekî encam derdixist ku dixwaze zengîrtin, pûçbûn, bêyomî, tenêbûn, genîbûn, bêesilbûn, xirabîya mirovan, civak û jîyanê îfade bike û li ser wan muzîkê çêbike. Ji vir û pê ve dahatûya Sîya Şevê dê çî be, dê çawa muzîkê biafirîne, geşedana wê dê çawa be? Bi ya min, wekî guhdarekî wê, divê bi felsefeyê nû muzîkê bike. Divê êdî muzîka wê ne pozîsyoneke îfadeker lê divê guherîner be.

Ji bo dinya, jîyan, eşq, hezkirin, terkkirin, jihevqetîn, heqîqet, welat, eş, dej... li ser nêrîn nû muzîka xwe ava bike. Ez nabêjim bila xweş bike û hêvîyan bifiroşe. Bila êşa guhdaran parve neke, êşa wan ji wan paqîj bike. Jîyanê, dinyayê, însan, nebat û heywanan û tîştan bide hezkirin. Bila muzîka xwe ne li ser nîhîlîzmê, muzîka xwe li ser jîyanê ava bike, hezkirina me ya jîyanê bilind bike.

Resenî û çîyawazî

Di muzîka kurdî de koma Sîya Şevê di nav muzîka xwe de vî zîndîkirinê dihewîne!. Çîyawazî û resenîya Sîya Şevê ji vir tî. Di seranserê muzîka Sîya Şevê de ev resenî û çîyawazî heye. Ez naxwazim vî dîyardeyê yek bi yek li ser her stranê nîşan bidim. Lê encama guhdarîkirina Sîya Şevê ev e. Bi taybetî jî di stranên Kebanî, Lê Dayê, Nesrîn, Werin Law, Lîce, Em Li Vir in de azadkerîya muzîka Sîya Şevê xwe dide der.



Heta niha 4 albûmên Sîya Şevê derketine

Navên albûmên Sîya Şevê wiha ne : Zeng, Pûç, Bêyom, Li Piştî Sîya Xwe. Gelek alîyên hêjayî nivîsandinê yên muzîka Sîya Şevê hene û mirov dikare wiha rêz bike;

1- Dengê Gokçe Selîm. 2- Gotinên Stranan 3- Muzîk û temaya muzîka wan. 4- Yekîti û hev-temamkirina komê 5- Fonsîyona muzîka wan a azadker e.

